# KUJERA HEST Û RAMANÊN ME: MEDYAYA CIVAKÎ



Armanc HÊVÎ

Medyaya civakî amûreke danûstandin, têkîlî û pêwendiyê ye. Cûdahiya wê ji amûrên ragihandinê yên din ev e ku ew gihîştina bilez û tavilê peyda dike. Televîzyon jî amûreke medyaya civakî ye, lê tenê dîtbarî ye. Dema ku telefon di rêza yekem de tenê ji gerandin û axaftinê erkdar bû, bi pêşkeftina teknolojiyê û zêdebûna hejmara bernameyên ku li ser têlefonên destan hatine sazkirin, ji xeynî armanca xwe ya sereke bi awayên cûda hat bikaranîn. Bi taybetî bi barkirina malperên medyaya civakî li ser têlefonê ve êdî telefon mîsyonek nû bi dest xist. Di roja me ya îro de telefon hemû karên ku li ser kompîteran têne kirin dikare bike û bi domdarî pêşxistina bernameyan ve gihaşt asta ku piraniya mirovan bêyî wê nikarin kêliyekê jî derbas bikin.

Her çiqas erêniya vê teknîkê hebe jî aliyê wê yê neyênî jî heye. Ku herî zêde rastî aliyê wê yê neyênî tên. Em dikarin bibêjin ku, pêşketina înternet, medyaya civakî di guhertina şêweya jiyan, kevneşopî û çanda ku civak ji dîrokê heya roja me ya îro parastine

de li ser bandoreke girîng çêkir. Helbet em bi hêsanî dikarin fêm bikin ku medyaya civakî ne di destê civakê de ye, di serweriya pergala kapîtalîst û desthilatdarên ku li ser cîhanê hikim dikin de ne. Pergala serdest bi destxistina teknolojiyê ve li ser civakê hebûna xwe nîşan dide û bi vî awayî mirovan rêve dibe. Weke ku di dîrokê de jî dizanin ev pergala serdest ti caran ji bo berjewendiyê civakê ne xebitî ye, berovajî timî pêşketina civakbûnê asteng bûye. Ji civakbûnê zêdetir mirovan takekes kiriye û ji qutkirina nirx û çandê wê mêtin kiriye. Û niha jî xwedî çekekî pir bi bandor e ku weke fizîkî nakûje, lê bi giyanî her kêlî, her demjimêr û her roj dikûje, ev jî medyaya civakî ye. Beriya niha ji bo mirovan rêve bibe bi hewldaneke zêde pergalê xwe pêş dixist lê roja îro bê ku hewldaneke zêde raber bike bi awayekî rehet mirovan rêve dibe. Lîberalîzm, îdeolojiya bingehîn a pergala serdest e; hest, mêjî û dilê mirovan bi azadiyên sexte îstîsmar dike û koleyên dildar diafirîne. Vê yekê lîberalîzm bikaranîna diyardeyên werzîş, huner û seksê ve mirovan bi xwe re girê dide. Dema naveroka medyaya civakî dinêrin, reklam, vîdyo û wêneyên ku bê daxwaza me tên ber çavê me bi awayekî eşkere vê yekê nîşan dide. Bi kurtasî pergala serdest a ku ser medyaya civakî serdeste, bi sûdwergirtina lewaziya mirovan hebûna xwe didomîne, sermaya xwe zêde dike, kesayeta koleyên dildar a ku lêpirsin nakin, ji watebûnê dûr û ajoyê xwe girêdayî ne ava dike.

## Bandora medyaya civakî li ser zarok û ciwanan

Di rastiyê de beşa yekê ya pergala serdest bi riya medyaya civakî dike armanc zarok û ciwan in. Ji ber ku di vê temenê de mereq, tiştên nû dîtin, aliyê fêmkirin û pênasekirina mirovan hîn zêde ye. Di rewşeke wiha de zarok û ciwanan ji bo pergala serdest a ku dixwaze pergala xwe mayînde bike û bi mêjiyên ku ji bo xwe bidomîne afirandiyê fersendeyeke.

Kesên ku hîn di temenê zaroktiyê de teknîkê naskiribin, nirxên manewî ku hebûna wan diyar dike jê dûrketin û biyanîbûnê dijîn. Ku niha demê ku dijîn pergala serdest bi çekên xwe yê medyaya civakî ve gihaştiye armanca xwe. Bi vî awayî dibînin ku çanda malbatê jî hêdî hêdî ber bi tunebûnê ve diçe. Her kesek xwe dixe quncikekê û medyaya civakî hembêz dike. Ji aliyê dêrûnî ve jî gelek pirsgirêk tên jiyîn. Hissiyata tenêbûn, xwe tune hesibandin, meyla şiddetê, birçîbûna cinsî hwd. pirsgirêkên dêrûnî jî bi xwe re tîne. Ji ber di ciwanan de mezinbûneke bi tenduristî pêş nakeve pirsgirêkên xwe naskirin û pênasekirinê jî tê jiyîn.

Di medyaya civakî de dan û standinê ku pêş dikevin piranî naverokê xwe vala ne û di jiyana şênber û rast de bersivê xwe tune ye, tenê girêdayî tatmînkirina ajoyê dan û standin tê pêşxistin. Lêgerîna mirovên ku ji xwe ne bawer, ji malbatê xwe hez kirin nedîtiye, tu pêdiviyê xwe nehatiye debirandin piranî danûstandinê ku beramberî zayendê xwe (jin an xort) pêş dixin ser esasê tatmînkirina cinsî ye. Ji ber medyaya civakî pêşiya wan kiryaran nasekine, qaşo feraseteke azadiya bê sînor ava kiriye mirovan jî hestên ku nejîne, dêrûniya xwe nebes dîtinê di dan û standinê xwe de diteyîsînin. Jixwe ev rewş herî zêde di nava ciwanan de tê jiyîn.

## Bandora medyaya civakî li ser çanda civakê

Pêşketina bi bandor a medyaya civakî salên 2000'î destpê dike. Jixwe medyaya civakî carekî ve negihaşt vê astê. Dîroka xwe yê berî timî bi cerîbandinan, keşifkirina tiştên nû giha vê astê. Di wir de tiştê ku qala vê dikin pêvajoyê ku pêşkeşî civakê hatiye kirin û civak asta jor de xwe pê ve girêdayî ye. Dema vê pêvajoyê wek beriya 2000'î û piştî vê binirxînin di navberê de çi qas cudabûn heye dikarin bibînin.

Girêdayî vê dema çanda xwendin û nivîsandinê digirin dest her çi qas bi awayekî giştî bandorê xwe winda nekiribe jî li gor berê paşde çûyîn heye. Êdî kesekî naxwaze nivîseke dirêj bixwîne, şuna vê agahiyên ku karibe xwe zûtirîn bigîhîne tevdigerin. Pirtûk û kovaran mîna muzexane ango kevnargehekê tê pêşandan. Di medyaya civakî de timî herikandina agahiyan heye. Hin ser vê agahiyê têgihiştinek çênabe agahiyên nû derdikeve pêş. Ev jî di mêjiyê mirovan de tevlîheviyeke çêdike. Agahiyên pêwîst, ne pêwîst her tiştê tê pêş xistin. Heta ji bo ferastê civakê baş rêvebibin agahî û diyardeyên ku sûdê dide gel jî parve dikin û di nava wan agahiyan de jî bi awayekî zirav istîsmarê xwe jî pêş dixin. Bi awayekî zelal nav rastiyê tiştên ne rast jî tev didin û civakê bi vî rengî li gor berjewendiyên xwe rêve dibin.

Bi nêrandineke din mijarê binerin, lîstîkên zaroktî mîna di kolanan de axê re dilîstin, kulîlkan kom dikirin, bi keviran û her tiştê ku digihişt destê zarokan ji xwe re dikirin amûrê lîstîkê hwd, êdî şuna wan zaroktî û ciwantiyê ku demê xwe yê giştî didin lîstîkên ser înternetê dibînin. Her wiha heta heskiriyên hev ji bo hevdu bibînin gelekî ked didan, nameyan dinivîsandin, cîh û warên ku karibin hev bibînin li ser wan nameyan diyar dikirin, mixabin niha ev çanda heskirina bi manewî jî şuna xwe daye heskirina ser medya civakî. Di wir de her tiştê ku dilê wan derbas dibe pir rehet hevdu re dibêjin û li pêşiya xwe jî ti astengî

nabînin. Lê ev jî êdî tiştê ku her du zayend di hevdu de mereq bikin, xeyalê wê bikin jî namîne. Heskirina ser medya civakî bi demê re vediguhere hevdu xapandinê. Ji ber bijare pir in, bi mîlyaran mirova dikevin wan malperan. Ji hevdu aciz bibin dikarin berê xwe bidin hinekî din. Di wir de jî manewiyat ji holê radibe, rastî dibe derew, xweşî dibe nexweşî, diristbûn vediguhere xapandinê.

## Bikaranîna rast a medyaya civakî

Pêşketina medyaya civakî ji binî de neyênî nabînin û dogmatîk nêz nabin. Her pêşketin, guhertin û veguhertin şoreşeke. Aliyên xwe yê jiyana mirov hêsan dike hene. Lê belê weke ku me li jor jî destnîşan kir aliyê vê yê erênî tê dîtin, lê bi awayekî bi pîvan nayê karanîn. Karanîna zêde û zirarê xwe yê ser derûnî û jiyana giştî mirovan heta di astekî jor de xeteriya vê pêvajoyê ku derbas dibin bi awayekî pir zelal dibînin.

Ti tişt bi tena serê xwe erênî an jî ne neyênî ye. Her qadê jiyanê bi girêdana diyalektîk ango du alî hevdu ve girêdayî ye. Heya dermaneke ji bo tenduristiyê mirovan baş be, dema zêde tê karanîn dibe sedema nexweşiyên cuda. Tiştê ku di wir de bê fêmkirin pîvan e. Dema ev pîvan baş bê fêmkirin karanîna medya civakî jî di aliyê baş û erênî de be. Dema bi pîvan bê karanîn mirov di jiyana şênber de dikarin bi hevdu re demê xwe derbas bikin, bi hevre tevlî faaliyetên werzîş û hûnerê bibin, di mijarekî de dikarin rû bi rû rûnên nîqaş bikin. Bi taybetî ji bo zarok û ciwan medyaya civakî rast kar bînin pêwîste nêzîkbûneke bi baldarî hebe, di vê mijarê de faaliyetên ku baş û nebaşiya medyaya civakî bide fêmkirin bên meşandin. Dema bi vî awayî rast fêmkirin çênebe kesên ji nirxên giyanî û manewî dûr dikevin, ji xwe biyanî dibin zêde bibe û sedema hebûna civakî jî bikeve bin xeteriyê de.

Dikarin li ser medyaya civakî gelek tişt jî bibêjin. Lê ez bawerim tiştê ku me di vê nivîsê de destnîşan kir têra xwe zelal  û eşkere ye. Ger ku medyaya civakî bi awayekî rast û bi pîvan bê bikaranîn nirxên manewî ku hebûna me diye dike dikarin biparêzin, li pêşiya pergala serdest a ku dixwaze nifşên nû di çerxê xwe de bihelîne û weke koleyên dildar hest û ramanê wan qetil bike bisekinin.

Herî dawî jî dixwazim hin tiştan bibêjim. Hin kêliyên xweş û taybet hene bila mirov re bimîne. Xwesertiya mirov bila bi wan malperan, wate û manewiyata xwe winda neke. Pêwîstiya mirov danûstandinê hebin, bila rûbirû hev bibînin û hestên xwe bi awayekî azad û wêrek rûyê hev bibêjin. Ez hêvîdar im kesên têgihiştî hest û ramanên xwe di kêliya şênber de bijîn.